

Welat 20  
20/04/2015  
Çandî - Gîştî - Serbixwe

سالا عوێ

دۆبەرا

# کوردستان

حەبەي کافەزک ئی وەیکە  
زۆی و بیکت مەصری سۆز  
ئەف خۆبەنی چەڕەدە  
لای بەدوختان پاشا  
قەدیان مەدحت بیکە  
ر چار دۆهزار چەڕەدە  
بۆتە آرسە و بیکە  
کوردستانی دە پەن خەکی  
زۆدە روزا چارکی نیت  
تەسەلەن

کوردی ایقان و تەحەبیل مەتابە آشۆینی لایون ئێدەیک

کوردیە غۆزە در

روزا پەنجشە دە ۳۰ ۹ تەبان مە ۱۳۱۱



# Welat



بەسە مەدە و مەکەن قەج مەتە  
چە شەر دێه دۆلەین مەن چە  
پارە دێه لۆی حیا حکات  
مەد هزار شکر وەد ژ خەن  
لۆ کرەن و غەلەنا مە و مەرفەبە هەش و زکا دامە و دۆخا  
لەبەرنا مە و مەرفەبە گەیک آیین  
نۆن دنیابەدە رەقەس مەلەت  
پادە مەکتەب و مەدرە و چەڕەدە  
نابە چەڕەدە دێشەن - سەفەر  
گەیک قۆما زۆدە تر خۆی هەش  
مەدە راست و قۆرە خۆدۆن و د  
خۆنەدە نەدۆنەن دنیابەدە چە  
و بە وێ چە بیکە رەقەس لۆما رەبەخەدە مەن آف  
بەدە پاشا تەبەسێ پادەنا خەدی قەالی پاش نەر مە پازە  
زۆدە چارکی آزی چەڕەدە مە بێشەم - ئاف ئی مە مەکرە

مەسەو وەسەلام گۆتە بە مە  
پارۆن انیابە زە مەلە خەدەدە  
وان ئێدە خەکی رەبە قەج نیشا وان  
بەن لۆما مە مەلەین کۆما چارە اون و مەط و نەسەنا  
نەزۆی دەر و لۆ دزەي اون مەب و آغا و کۆمەلەین دەلەن  
وان ئێدەنا غەلەنا مە و مەرفەبە بیکە رەبە نیشا وان



## Navê bajarê me

Aras Yûsiv

**P**iraniya xelkê bajarên Rojavayê Kurdistanê her ku dixwestin navê bajarê xwe bibêjin divabû navê Erebi yê ku destelata B'es li bajarê wan kiribû jibîr nekin lewra wan navê Kurdî yê bajar digotin û navê Erebi jî digotin, herhal li saziyên dewletê pênasîn tenê bi navên Erebi yên bajarên bû. Guhertina navê bi sedan gundan û piraniya bajarên li Rojavayê Kurdistanê yek ji şeweyên tunekirina Kurdan û hebûna wan bû.

Çendî ku mirov karîbe xwe li ber zordariya sistemeke totalîrîte bigire carinan bê mebestî bandorên wê sistemê li wî jî dibe û yek ji wan bandoran ku "Kurdên Rojavayê Kurdistanê navê hinek bajarên bi Erebi di nav xwe de jî digotin, û vê yekê bi salan dirêj kir.

Îro û piştî ku Rojavayê Kurdistanê hilma azadiyê kir, êdî navên wan bajarên bi Kurdî û ne bi Erebi li wan dibin, belkî destpêka vegeandina wan navan ji bajarên re ji xwepêşandanên ku di salên pêşî yên şoreşa Sûrî de bûn, dest pê kir. Ew jî dema ku di weşana zindî de ji xwepêşandanên li wan bajarên çalakvanên ku bi weşanê radibûn

Kovara **WELAT**  
Çandî- Giştî- Mehane



Sernivîser:  
**Aras Yûsiv**

Desteya rêvebir:  
**Xweşnav Heso**  
**Mihemed Zekî Mihemed**

Dizayner:  
**Hesen Berzencî**

**Têbînî:** mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

navên Kurdî yên bajarên di dema weşana de datanîn ber kamîreyan û cihanê tevî ev nav nas kirin û ew salên dirêj ji planên hikûmeta Be's û zîlamê wê bê hûde çû.

Weku berê kêman caran navê kurdî yê bajarên di saziyên fermî bi kar dihat, îro navê erebî yê wan bajarên kêman caran bi kar tê, bi hêviya ku sibe ev bajar tenê bi navekî bin û ew jî navê wan yê kurdî an dirokî yê ku navekî bi tenê ye .

Weku çênabe mirov du navên wî hebin, ev bajar jî wek mirovan e navekî wan yê tekane heye, ev bajar navên wan :Efrîn, Kûbanî, Serê kaniyê, Dirbêsiyê, Am ûdê, Qamişlo, Tirbêspî, Rimêlan, Çilaxa, Gir kê Legê, û Dêrik e û ne ti tiştêkî din ji bilî van. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ  
adopt a revolution



## Ronîkirin li ser yekemîn rojnameya kurdî ( Kurdistan )

### Amadekirin: Diljar Emîn

**B**i hatina 22-nîsana 2015 an mûma 117 an ji temenê yekemîn rojnameya kurdî bi navê ( **Kurdistan** ) tê pêxistin, quncikên tarî di rîya rojnamegeriya kurdî de ronî dike.

Bê guman e ku dîroka pêşketina rojnamegeriyê li cem hemî miletan bi bandora gelek hêmanan ve girêdayî ye, wisa jî rojnamegerî bandora xwe li derdora xwe dike.

Rojnamegeriya kurdî bi gelek hêmanên ku bi gelê kurd ve girêdayî bûn, têkildar bû, geşbûna hestên netewî, berzbûna tevgerên rizgarîxwazên netewî, ji hêmanên sereke bûn yê ku bandora xwe li tevgera rojnamegeriyê û pêşketina wê dikirin, li cem hemî gel û netewan.

Sebarefî rojnamegeriya kurdî, di dirêjahiya bêtirî sed salî de, bi xebata tevgera rizgarîxwaza netewî ya kurd dijî destlae ta **Osmanî** ve girêdayî ye.

Ji loma **Mîrê gewre Miqda midhet Bedrixan** di 22ê nîsana 1898 an de, yekemîn rojnameya kurdî bi navê **Kurdistan** li bajarê **Elqahîra** weşand.

#### Giringî û sedemên derçûna rojnameya Kurdistan:

\* yekemîn rojnameya kurdî di dîroka rojnamegeriya kurdî de, û berdevkê gelê kurd bû.

\* Nameyek ji sultan **Ebdilhemîdê** diwem û nijadperest û şoven û toraniyên derdora wî re bû, ku gelê kurd miletekî sax e, xwedî dîrok, çand û şaristaniyeke taybete, ji mafê wî ye ku bi rûmet û azad li ser xaka bav û kalên xwe bijî.

\* Agehdarkirina gelê kurd bi pêşketin û nûçeyên ku li cîhanê diqewmin.

\* Navtêdanek bû ji gelê kurd re ku li **zimanê** xwe xwedî derkeve, û **zimanê** xwe kê m nebîne.

\* Belavkirin û çandina tovê hezkirinê di civaka kurdî de.

\* Belavkirina zanîn û zanistiyê, bilindkirin û pêşxistina asta çanda gelê kurd.

Ev yeka han diyar dike ku **Mîr miqdad** dizanî, ku çawa zia man nasnameya netewane, wisa rojnamegerî jî zimanê gelane, û rola zanîn û zanistiyê di pêşketina civakê de, pir giring û pêwîste, ji ber ku hişkbawerî, kîn û zikreşî di civaka nezan û paşdemayî de ciyê xwe digre, lê belê hezkirin û demoqrasî di civaka zanist û pêşketî de ciyê xwe digre.

**Çima botan û bedirxanî hilgirê ala xebata netewî û çandî bûn:**

\* Herêma botan ji destlata **Osmanî** xweser bû.

\* Bi hebûnên xwe yê xuristî dewlemend bû.

\* Hermêke bazirganî bû.

\* Piraniya zaroyên malbatê li ewropayê xwendine, û ji çanda ewropî vexwarin e.

Gelek navdar û rewşenbîr ji malbatê deketine, **Miqda bedirxan, Ebdilrehman Bedirxan, Ebdilrezaq Bedirxan, Kamîran Bedirxan û Mîr Celadet Bedirxan.....**

**Çima rojnameya Kurdistan li Elqahîre derdiket:**

\* Di wê demê de Misir serbixwe bû, tenê bi nav bi destlata Osmanî ve girêdayî bû.

\* Nakokî di navbera alîgirên Dewleta Osmanî, û dijberên wê de hebûn, nemaze yê ku li ewropa xwendin e.

\* **Mihemed Elî Başa** kurd bû, ne Elbanî bû, ji malbatekê li dora bajarê Diyarbekrê bû.

\* Çapxaneyên pêşketî li Misrê hebûn, neû maze li Qahîr e.

#### Hejmarên rojnameya Kurdistan:

Sî û yek (31) hejmar jê derketin ji (1-5) li Qahîra, (6-19) li Cînêv, (20-23) li Qahîre (24) London, (25-29) li Folkiston başûrê birîtanya, (30-31) li Cînêv.

Hejmara dawî (31) di 14ê nîsana (1902) an de bû. (2000) hejmar jê bê pèrê li kurdisb tanê belav dibûn.

Rojnameya **kurdistan**, gelek guhdan li aliyê çandî dikir, mîna belavkirina beşên **Mem û Zîna Ehmedê Xanî**, ronîkirin li ser onîkirin li Zîna Ehmedê Xanî. n li aliyê çandî dikir, mîna belavkirina beşên Mem û Zîna Ehmedê Xanî. n, Safê wiye ku bi rûmet user ( **Elhedîye Elhemîdiye** ) ya **Şêx Yûsiv Di, ya eldiê n**, weşandina koçkirina helbestvan **Hacî Qadirê koyî**, gelek çîrok ji folkilora kurdî.....



Ji hêla siyasî ve jî,roleke nixrdar,berz û bilind leystiye,du helwestên pir wêrek û mêrane standin e:

\* Şermezarkirina **siwarên hemîdî**,ku piraniya leşkerên wan kurd bûn.

\* Riswakirina kuştarên ku di derheqê **Ermeniyan** de di hatin kirin bi destê destlata **Osmanî**,û bangkek bû ji gelê kurd re ku di wan tawanana de ne pişkdar ne be.

Birasî,di kurte gotarekê û,emê nikaribin jiyana **Bedirxaniyan** û pêvajoya xebata rojnameya **Kurdistan** ronî bikin.

Tenê pêdiviye ku mirov bîne zimên,ta ku mirov karibe,pareke biçûk ji mafên wan li wan ven gerîne,ew jî eve:

**Bedirxanî**,tu carî ji bin siya kurdperwerî,welatparêzî û kurdayetiye dernektine,tim berjewndiya gelemper di ser ya kesane re girtine.

**Ezîtiyê** riya xwe di dil û hişên wan de venkiriye.

Ji bo netewa xwe,çand û rewşenbîriya kurdî,pir êş û cefa,mişextî,belengazî û surgonî dîne,lê serê xwe ji zordaran re dananîne,mal û mewdanên xwe tev berdane,lê bi erzanî xwe ni spartine dijminan.

4

دوینرا سالا عولی عدد ۱

عنوان: **کوردستان** ۱۳۱۵

محرره: کوردستان، فرانسوی  
صاحب و مرمی: بدرخان پانازاده  
مقدار: مقدار محدودیت  
موضوع: ...  
مکان: کوردستان  
تاریخ: ...  
قیمت: ...  
مکان: ...

تاریخ: ۳۰ ذوالقعدة سنه ۱۳۱۵ پنجشنبه في ۹ نيسان سنه ۱۳۱۴

بسم الله الرحمن الرحيم

صد هزار شكر و حمد ز خدی تعالی دره آم مسلمان خلقی بکرن . وظایفنا علم و معرفتیه هس و زکا دامه . در سقا قلباننا علم و معرفتیه گلیک آیین چلبه و اسادیت شریفه هین دنیا بیده ریفاک مسلمان هین گوننه و پاژ برین ایجاده مکتب و مدرسه و جریده هان دنیا بیده چه دبه چه ناه جریده دینین . حقیقان تیت ز کرداره کسرد بگلیک قوما زیده تر خوئی هس و زکانه جانیرن دینین نوموده راست و قویته خودین و دیسا و که قوییت دی نه خونندان نه دواندن دنیا بیده چه دبه جبران وان موسوقوف جاویه دی چه بکه نظران لوما و پیاخنده من آف جریده باعا تریسی یا دقا خدی تعالی باش نو هر پاژده بوژاده چارکی آزی جریده کی بنهیس . ناف فی من مکره کوردستان ) فی جریده بیده آزی بیجا قیبا علم و معرفتا بکم

یکو دزی مروف و کله یکو دزی مدرسه و مکتب قنج هه آزی نیشا کردا بکم یکو دزی چه شر دبه دوشین مکتب چه دکن جاوه شر و کن تجارت جاوه دبه آزی حیا حکمت بکم حتی نو کسی جریده کی هولی تشبیه به آف جریده یا مناها یا عولی به لوما وی گلیک کیایی هین . از هینی حکم کیایی جریده فی زمانه بنهیس حی تشب و کی تو چه فرین رکن پائی هتکی دبه د کوه ریده آف ای دبی آزی دست مقصدی بکم . ( ومن الله التوفیق )

حضرت پیر میر علی الصلوة والسلام گوئی به « العلماء ورثة الانبياء » آنکو علم وارثین انبیاه تر طرفه خنده مامورن و عطف و نصیحتی بیدن خلکی ریا قنج نیشا وان یکن لوما گئی . علایین کردا جاوه اون و عطف و نصیحتنا ییزی د دن ولی درنی اون میر و آقا و کرمالین دلسن وان تشویقا ظایفنا علم و معرفتی بکم ریا قنج نیشا وان یکن هکی اون وی لیک گئی حیا مطوی و به





## Avahî qedexe ye

Rodî Hemê

Bê pêşgotin ....

Çarkoşeyeke ewledar û amade ji avakirinê re, nêzî 12 doniman e, li rojavayî goristana bajarê Amûdê ye, têde a, ilikitrîk, ragar û têla telefonê heye, herwiha rêya qîrkiyê di ber re, diçe..

Pirsgirêk çi ye?

Hikûmeta Sûriyê, ji bo berjewendiyên nas, avakirin li vê xakê qedexe kiribû, him ew dikir girêdayî bi goristana bajêr û him ew dikir girêdayî bi Şareyariya Şûnwaran û ew bi girê Şermola ve, girê dida .

Divê hûn bizanibin ku nîvê goristanê yê aliyê rojava hat pêşkêşkirin ji wîzareta Olî re, ji hêla Hecî Ûsivê Şêxmûs ve, xwediyê yekem ji van 12 doliman re.

Pirsgirêka nuha çi ye..?

Ku şaredariya Amûdê- Komîta berpirsariya avakirinê – endazyarê perpîrs, Heman gotin û bersivan dide û careke din vê xakê bi Şermola ve girêdide, bi vê yekê girêkeke din li benê me dixê, ango pirsgirêkê asêtir dike.

Sîhaneta girê Şermola li gorî gotina endazyar eve:

Ji aliyê Başûr ve; 70 mitrî başûrî rêya Zinarê – ji rêya Hisiça ta çemê Xinzîr-

Ji aliyê Bakur ve, nediyare çiku avahiya bajêr ghiştiye ber gir.

Ji aliyê rohiat ve, ta rêya Hisiça, û ji aliyê rojava ve ta çemê Xinzîr.

Ji bo diyarkirinê; di navbera gir û van sînorên wîyî nîgarkirî de, 200 mitir li Başûr, Bêtirî 300 mitrî li rojavayê wî heye û rûbera wî nêzî 2 donima ye, û hemû cureyên avakirinê di van sînoran de qedexeye , çima?, di heman demê de, Girê Mozan ê ku rûbera wî bêtirî 50 donimî ye, sînorê ku avahî têde qedexeye digihêje 500 mitirî ji hemû aliyên ve, û ji bo zanînê avahiya



xaniyên biçûk tede ne qedexeye, lê belê avahiyên Kargeh û pirojeyên mezin têde qedexeye. Herwiha li hawîrdorê gir bi dirêjbûna 50 mitirî tu kar tede nabe, ango qedexeye, weke ku mamoste S. Ehmed diyar kir.

Ku em herdu nemûneyên xwe – Girê Mozan û Şermola- bidin ber hev, û balê bikişînin ser cudahiya di rûber û sîhaneta wan de, çiku herdu di heman herêmê de ne û girêdayên heman bajarî ne jî.

Nuha çima Şareyariya Şûnewaran dihêle ku ev xak – li Amûdê- werne kirin û firoştin û bi awakî fermî, di heman demê de, wî bi xwe ve, girê dide û avakirinê tê de qedexe dike. Ev yek bûye pirsgirêkeke mezin ligel xwediyên van 12 doniman, yek ji wan Ekremê Sosê yê ji me re got: Min ev perçeyê xakê kirî ji bo ez ji xwe re xaniyekî têde ava bikim, lê ta nuha tu kesî erênî nedaye vê yekê, herwiha çend hemwelatîyên din jî di vê pirsgirêkê de dijîn mîna: Sma'îl Mihemed û Hemîd Beşîr û malbata Hecî Derwêş ya ku bêtirî perçakî kiriye . Tişê ku mirov dêşîne; ku li pênc ciyan li hawîrdorê gir xanî hatine avakirin û tu kesî an hêlê ew neseandin û beşê bê xwedî û pişt nabe kevirekî li ser kevirekî deyne. ■



## Rewşenbîr ê Kurd .. û Rola wî di Civakê de !..

Izedîn Salih



**R**ewşenbîr .. gotineke pir tê bikaranîn van rojan û gelek naskirinên vê gotinê hene , lê di derbirînek sana de tu dikarî rewşenbîr bide nasîn ku ew kesê çandêke bêhempa li cem wî heye ji ber ku pir dixwîne û di dîrokê digere û zanînê kom dîke ji berhemên jiyana xwe ya bûrî û çanda civaka ku tê de dijî , û rewşenbîrî ne tişkî zikmakî ye bi mirov re çêdibe lê belê bi rojan re te bidestxistin li gorî pêleya lêmiqatebûn a mirov bi wê , û rewşenbîrî yek ji bingeheên avakirina civakên pêşketî ye û ewe ya ku civakan ji hev rêz dîke .

Li cem Kurdan Rewşenbîr cihekî giring di binyada civakî û rêzanî de digre , ji ber ku ew rolek bingehî di avakirina civaka serkeftî de û pêşxistina wê de dilîze , lê em hin caran dibînin ku beşê rewşenbîran li cem me Kurdan durrî xwestekên qonaxê ne û ne li gorî erkê xwe ne di ber gelê xwe de û kêşeya wî ya dadmend , û yek ji sedemên vê rewşê rêderdiya ku mirovê Kurd dikişand ji aliyê Desthilatên dagîrker ji Kurdistanê re bi tunekirina nasnama Kurdî di riya hînkirina mirovê Kurd bi zimanekî ne zimanê wî û têrkirina wî ji çandêke ne çanda wî û dirokeke tersî dîroka wî .

Û Giringiya Rewşenbîrê Kurdê tê ji encamên bûyerên guhertinê yên di Rojhilata Navîn bi giştî û Kurdistanê de taybet de çêdibin , û Erkê ku tê ser milê Rewşenbîrê Kurd di rexistina civakê a wî de

û pêşengtiya vê civakê bo misogirkirina mafên netewî yên Gelê Kurd bi riya xebat û tekoşinê berdeham û tomarkirina dîroka Kurdî ji tunekirinê û Zimanê Kurdî ji windakirinê , wisa Rewşenbîrê Kurd dibe hêza xurt di dehfandina pêvajoya Xebat a Niştîmanî de û bicîkirina armancên wê û xurtirîn çek di rûwê dijminên Kêşeya Kurdî û Desthilatên dagîrker ji Kurdistanê re .

Û Di axaftina me de li ser Rewşenbîrê Kurd emê bal bikişînin ser hinek aliyên neçê yên li cem Rewşenbîrên Kurd peyda dibin û dibin Kelemek di riya rabûna wan bi rola ku ji wan tê xwestin van Rojan , ji van Neçeyan pêgirtina Gelek Rewşenbîrên Kurd bi Partiyên wan û bervaniya wan di ber şaşiyên van Partiyên û nepejirandina wan ya qutbir ji rexne re û tawanbarkirina wan ji kesê li dijî nerîna Partiya wan re ku dibe sedema jibîrkirina armanca sereke ji van Partiyên re yên ku doza Mafên Rewa ji Gelê Kurd re dikin ba avakirina Welatê wî yê Bendewar li Ser Xaka wî ya Dîrokî ■

## Ahenga nûjen

### Xweşnav Heso

**D**i zindanekê de, ku li bin rûyê zemînê de hatibû çandin, tîrêjên rokê derfet nedîtin ku êrîşa xwe bide li dîwar û li kesên wê zindanê!! , ji bilê tîna rokê û gerandina gokzemînê, dilop û çirav û barçemok xwe kiribûn bi cih û war li wê derê !!.

Dem Buhare, lê şeve yan roje, û çi roje?, ew vî tiştî nasnakin!, lê girtiyên me naskirin ku Buhare, ji ber ew kulîlkên ku hatibûn vekirin piştî ku hatibûn çandin di nav por û rihên wan de, belê ji xwîn û hêşiran hatibû avdan !

-hûn dibêjin ev bûye çend heyv ku em hatine girtin? »Şoreş pirsî»

-kuro dîno!! ,bêje bûye çend sal «Mizgîn got» .

\*Derdo jî piştî xwe dabû dîwar, û nîgek dirêj kiribû, û serê wî dibêr wî deye, Derdo serê xwe hilda, û hêdî got: »bûye sê sal em hatine girtin ! « .

-sê sal ?, «Şoreş wisa matmayî got»

-tu çi dibêjî apê Derdo? «Mizgîn pirsî».

-na na ,tu şaşê ! «Mizgîn got û çavên wî li Derdo ye, qey dixwest ku Derdû bêje ev henek bû!

Lê Derdo nêzîkê wan de hat, û destê xwe dibin riha xwe de kir, û nîşanî wan kir !!

\*< Derdo, zilamekî di şêst salî de ye, bavê du mamosta û sê karkira ye, û vê gavê jî, ew kalê çardeh keç û xorta ye!, lê rebeno ta vî temenî jî, riha wî bi temamî derneketiye !! û têlê di ruyê wî de têne jimartin

belkî ev nexweşiyê be!, û belkî xweşiyek be?! lê ku çawa be, ew kes û karên wî, naskiribûn ku ew bê rihe! > .

gava çavê Mizgîn û Şoreş li wê rihê ket, ji çavên xwe bawer nekirin!, kuro ev çiyê yaw?

ev ne rihe, belkî ev werîs be? yan jî belkî tayê lihêfan be û di ruyê Derdo de şîr hatibe! dengê nigên leşkeran dîsa hat , hêdî hêdî nêzîk dibe, lê vê carê, wek her carê kûçik bi xwere ne anîne! .

-Hirmiiiiiz, vaye dîsa Ehreman hat ha ! «Mizgîn wisa got û çavên wî li ezmanê zindanê ye»

Şoreş jî wek her carê, xwe amade kir, û bi ken got: »bila berê berê lêdan û dar li min bibe «

Di wê tariyê de dergehê zindanê li wan hat vekirin, lê vê carê ne ji bo lêdanê ye, diyare ku, berdana wan hatiye!

-dayê qurban !, dawiya dawî ewê çavên min li te bikevin, berî mirinekê.» Mizgînê şazdeh salî wisa got», û Şoreş di ber xwede wisa got:

»Ez bawer nakim ku emê ji vê gorê rizgar bibin!, ma gelo hê yaramin li hêvya mine?, yan mêr kiriye?»

Şoreş wisa ji xwe dipirsî, û hate bîra wî, ku çawa hate girtin berî xwestina wî bi du rojan !

Derdo jî rabû ku xatir biwaze, ji barçemok û konên pîrê!

her sê heval ji wê goristanê der ketin !\*

-aaax! ez nikarim çavên xwe vekim ! «Derdo got» .

-ooox! azadiya mirov çendî xweşe ! «Şoreş bi ken got» .

Lê Mizgîn bê deng û matmayî mabû, ji ber ku ew gihîştine nîva bajêr û hê çavên wî li mirovekî neketiye!

-ma gelo li bajarê me wek» Helebça û Hîoşîma « bûye?

yan ew bombeyên Firansa li» Amûdê « dibarîn , çendek ji wan gihîştine vî bajarî ?!

-apê Derdo, kanîn millet kanîn?? «Mizgîn pirsî»

-xwedêê!! , kesek li bajêr nemaye !!! «Şoreş got» .

Hê Derdo li hawîr dora xwe dinêrî, û çavên xwe digêrand ku belkî kesekî bibîne, dît ku kertek ji ber ba hate li ber nigê wî rawestî .

-apê Derdo ,ev çi kerte ? «Şoreş pirsî»

-belkî firokên dijmin ew barandiye ?! «Mizgîn got» na na ! , Derdo bersiv da û berdewam kir : -

» ev kert ji partiyekê ye, ew binavê (p.q.r) ye, Millet vexwendiyên ahengek mezin dike, li gundê cûdabûnê « .

-aheng kengî ye ? «Mizgîn pirsî»

-aheng îro ye! «Derdo vegeand» .

Hê ew di vê rewşê de bûn, dîtin ku sê kertên din ji ber ba hat ! her yek ji wan, ji partiyekê ye, û her yek ji wan endamên xwe vexwendiyên ahenga xwe ya taybet dike!

belê tiştê baş ewe ku cihên wan ahengan, ne dûrî hev in!

Derdo û herdû ciwan\ Mizgîn û Şoreş\, xwe rakirin û bi hêla wan ahengan de çûn,

mebest ew bû ku nasbikin sedema van ahengan çiyê, û boçî hemî di rojekê de ne, lê sedema yekem ew bû; ku malbatên xwe belkî li wir bibînin! .

her sê heval gihîştin cihê ahengê, û ev ya



yekeme,xwiyabû ku ew ahenga (p.q.r)ye, ev tişt naye veşartin,ji ber simbolên wê ya taybet,û ala wê taybete,ta ezmanan hatibû bilind kirin!

belê wêneyê serokê vê partiyê li her derê li dar bûn.

lê ta vê gavê kesekî ji wan nasnekiriye sedema vê ahengê çiyê!!!,diyare ku pirogramê vê ahengê tevde li ser dîroka partiyê ye,û serokê vê partiyê ye!

lê ev çi ahenge? «Derdo di ber xwe got» ,rengê wan ne rengê miletê me ye!,û cilên wan jî, ne cilên meye!

bi zimanekî daxivin ew ne zimanê me ye!!

awaz û stranên wan jî,ew ne yên me ye!

ev çi ahenge?,ev aheng ne ahenga me ye,û ev kesên beşdar ew ne kesên me ne!

belkî dijmin miletê me ji vî warî derxistibin,û miletêkî din li dewsa wan anîbin! û ev jî ahenga wan be?!

lê kanîn miletê me li kuderêne?

-belkî em di zindanê de sê sed salî mabûn,ne tenê sê salan !!! «Şoreş got».

-xwedê!em jî bûne wek xwedyê şikeftê? «Mizgîn pirsî».

-em şaş hatine vê ahengê!ev ne ya ku miletê me li wê bin!! belkî li ahenga din bin? «Derdo got» .

-de werin em biçin ya din!! «Şoreş biryar da».

\*Lê ahenga din jî wek ya pêşî bû,tenê navê partiyê û simbol û wêneyên serokê vê partiyê hatibû guhertin!

ev aheng jî ya partiya(s.g.k)bû, li vê ahengê jî her sê heval,ne kesên xwe dîtîn û ne jî miletê xwe!

-ev jî ne ya me ye,ka em biçin ya din! «Mizgîn bi xemgîn got».

ahenga sêyemîn ya (p.m.k)bû, lê vê carê cemawerên wê bêtir bi hêz û çalakin ,nemaze,gava pêşkêşvan ji ser textê hofkê bi dengê bilind navê serokê partiyê digot!!

-em çibikin yaw? «Mizgîn bi xeyd pirsî»

- ev her sê aheng, bi zimanekî daxivin,ew ne zimanê miletê me ye !,û dîlanên wan jî ne yên me ye,raste ku em sê sed salî di şikefta xwe de mane! »Derdo bi dil şewatî got û hêsir kete çavên wiyê melûl, belkî dixwest ku zarokên xwe bibîne berî mirinekê?».

-ev çi xelkin?,em tu kesî ji wan nasnakîn! »Şoreş got»

\* Roj bervî ava diçe,her sê heval hê li miletê xwe digerin, ji ahengekê diçin ya dî, lê mixabin bê sûdeye

çavên xwe digerînin lê dîsa jî kesî nasnakîn!

-ma gelo em hê di sînore welatê xwe dene? «Derdo pirsî».

-belkî em bi şaşî hatine «Emrîka»,û em hajê tunebin!

»Mizgîn ê dil şikestî vegerand».

-bi xwedê welat ew welate,ne hatiye guhertin, lê milet hatine guhertin !!! «Derdo wisa bi xeyd got».

\*Mizgînê can bi kul, li Derdo nerî,û got:

» Her tişt hatiye guhertin, û tuştêk li ser tuştêkî nemaye! ,min zanîbû ew riha te di sê salan tenê wisa dirêj nabe apê Derdoooo!! «.

Şoreşê ku di cengan de sînga xwe ji gulan re vedikir, û di ahengên netewî de her tim ew serkêşî govend û dîlanan bû,û ji boyî mafê miletê xwe kete zindanê; dûrî malbat û yara xwe ket,vê gavê li ser çogên xwe rûniştiye,û kela girî di qirka wî de ye, pirsî û got :

» Deşt û çiya û newal yên berê ne,û ax hê sore ji xwîna gelên me yên pakrewan, ezman jî hê ya berê ye ku şînbûna xwe ji çavên yara min dizîye, û hê dijmin li ser vê xakê dagirkire,lê ez nizamim miletê me tevde bi kude wenda bûne!,ez nizamim bi kude çûne,me ev ahengan yek bi yek li hev xist,lê mixabin me ne heval dît û nejî cînar,û nejî dê û bav û yar,sedema van ahengan çiyê?, û ji kê re çêbûye?me ev jî nasnekir! « .

Derdo ji derdan û ji wê meş û gera dijwar,can da ji dest!, Derdo çûye li ser dilovaniya xwe bê ku zarokên xwe bibîne, û hate veşartin li cihekî nenas, li bin dengê wan ahengan û awazên biyanî û pevçûna wan partiyan de

û Mizgînê ku xwe ji hêsirên şilkiribû ji bo dîtina malbata xwe, wenda bû di nav şer û pevçûna endamên (p.q.r),û endamên(p.m.k) !

Şoreş gelekî li Mizgîn geriya lê...?!!

Şoreşê me pişt şikesî, û dil birîn mabû,bi tenê maye di nava ew kesên biyan!,di hundirê xwe de dibêje :

» xwezî ez ji zindanê der neketama «

Bi hejarî û ser bi jêrî Şoreş pişt xwe da ew hemî ahengan,wek çawa ku rokê jî pişt xwe da gerdûnê.

Şoreş dimeşe lê nezana ku bi kude diçe , ji ahengan dûrket, lê hê dengên wan dighêjin guhêwî,

Şoreş dimeşe û hêsir ji çavên wî dibarin, peyva dawî gihîşt wî ji partiya(p.q.r), yekser bi Kurdî dibêje :

» Ahenga me bi dawî hat,ta Newrozek din hûn bimînin di xweşiyê de,û her bijî xebata me,û kardarê partiya me!»

## Por kurê Fatooo !!

### Xweşnav Heso

*«wax wax wax !,hê van bêxwedîkên cînarên me li ber devê derî rûniştine!.*

*Xwedêyooooo !!, ma van por kurana bê xwedîne? malên wan tuneye ? Qey bîra malên xwe nabin?!, weyla agir bi wan û malên wan bikeve hahe, û şîrê germ li ser...ê wan birje !!! « .*

\* min wisa di ber xwe de digot û dipirsî,gava ku ji tiq tiqa kenên wan sitêrk û heyv dihejyan ,wekî her timî, min hewş dişuşt , gava dengê dayika min ji derve hat, wek qereçiya bang dike :

Dilşa !!, keçê wa Dilşaaaa -

». çiyê yadê??! « min vegerand -

- de zû bike keça min, ma dendik çênebûn??

- weyla hûn jehrê bixun!! « min wilo di ber xwe de got, û ez çûm dendika ji wan re sor bikim «.

\* Xwedêyooooo !!, ezê çî bikim ji dayika xwe, va dîsa wek her rojê civata wê û hevalên wê li ber deriyê hewşa me gerya ye, xwelî li sera li ber devê derî rûniştine û berên xwe dane tarê!, pênc- şeş pîrekên jinbî ne, tevde di temenekî de ne,û civîna wan xweş nabe,heger dendik û çay li ber wan tunebe !.

- lê lê Fato,por kurê,binêre !

li çî binêrim Xensê? -

- keçê pepûkê, binêre,wa keça Ferîda çawa li ser xanî diçe û tê,bila min zanîba ew li hêviya çiyê,û bila ev kirasê li min ne li min ba!

- wîîîî !!, weyla xweliya min li serê te be Xensê,ma hê te ne bihîstiye?!

!! - çima,çî heye ?,zû bêje Fatoooo

- keçê mane keça Ferîda û lawikê Leyla ji hev hezdikin,û her rojê ji ser xanî bi hev re dikenin !.

- hîîî !,pepûkêêêê!! , belkî ew hevudû dibînin jî ?!, çima na? ne dûre bi xwedê!!, ji ber ku malên tara me tevde,bihvre hatine girêdan û bi heve

ne!!, û ne dûre ku bi şevê têne li ba hev ji ser xaniyan de!,û bi hev şadibin, û ramûsanana ji lêvên hev distînin!!!, û ne dûre ku piştî çend rojan em bibînin ku keça Ferîda zikê wê li ber devê wê be,û pîçekî ji xwe daxîne !!!!

\* cînara me Xensê wisa digot, gava min sênîka dendika û çay ji wan re derxist derve, min herdû sênîk da li destê dayika xwe, û ez bi lez derbasî hewşê bûm, ez tirsyam ku li ser min jî - van bê xwedîkan- bipeyivin,û bê bextiyar bikin !,Xwedê kesekê nexe devê wan hahooooo !!! . ■





## Bextê Danîş

Idrîs Hiso



**H**ebû nebû dilovaiya xweda li dê û bavê min û we bû.

hebû gundekî biçûk nezîkî serxetê bû, gund biçûkbû bi tenê 25 mal têde hebûn , hemî malên gund meriv û kesûkarbûn, bi tenê malek ji serxetê vê dawiyê hatibû û kesûkarên wî hemû li serxetê mabûn, navê wî Danîş bû, lê gundiyanjêredigotin Çayîbîsedema ku ji çiyayê serxetê daketiye deşta binxetê, kesûkarên Danîşê Çayî li Merdîne bûn, herdemê xelkên gund behsa wan dikirin û digotin mirovên Çayî li serxetê dewlemend û zengînin lê tu carî mirovên Danîş bi ser wî de nehatin da ku xelk binasin aya bi rastî mirovên wî dewlemendin an na ?

Danîş xwedan 7 mendal bû 6 keçik û kurek, lewma herdemê hest dikir ku pişta wî nîne û gelek caran eşkere wê digot: Ez ji vî gundî xerîbim, bê xwedî me, û biserde jî xweda kurik neda min ji kurekî pêve , lewa pişta min kule, ez bê kesim !.

Erê her çend gundyan jêredigot Danîş tu yek ji me ye, ma ev çi gotinin ku tu dibêje, lê her wî hest dikir ew bi tenêye û kême.. Jiyana gundyan ligel Danîş jî rojane derbas dibû, û hemî mijûlî terş, mirîşk, qaz û dewarên xwe dibûn .

Mala Danîş li rexê bareşî gundbû, wî jî mîna gundiyan çend mer, berx, mirîşk û qaz hebûn û mijûlî wan dibû jî sibê heta êvarê.

Lê mîna ku Danîş derbarê xwe digot : Bextê reş reşe, bextê wî reş geryabû û rovîyek miseletî mala wî bibû rojekê erê, rojekê na çêçik û mirîşkên Danîş dixwarin.

Danîş neçar bû, tevî ku kêfa wî ji seganre nayê jî, ku here segekî ji gundê rex xwe bikre.

Seg anî mal û lê miqatebû nan, şîr, û xwarina ber destê xwe dida seg, ta ku seg li Danîş banya û xwe li malê girt, êvarê dema Danîş mirîşkên xwe dajotin lûsê û ji wan re bi ritmekî taybet digot : (mirîşk lûs mirîşk lûs ... mirîşk lûs...) ne tenê mirîşk diçûn lûsê, naxêr seg jî di da teqala wan û diket hindirê Pîne (koxê)... Danîşê Çayî bi dengekî bilind bangdikir ber bi ezman ve ... ez çibikim bextê reş, reşe û hew !. ■



## Bûye Demek

Hozanê Girkundê

Dilerizim ji cemedâ  
bêrkirinê .  
guliyê tenahiyê  
dihûnim li keştiya şevê  
siwar dibim  
ji pêşîra bêdengiyê  
taliya jîne  
dimêjim  
sawîrên wêneyê te  
min davêjin  
asoyekî dûr  
min di paxila  
peyvan de wînda  
dike bi dil germî  
laşêmin himbêz  
dike ... mîna zeviyeke  
tî xwe tevî dînbûna  
sîngateyî bûharî  
dikim  
hestên te yî  
evîni bi nazdarî  
li çola dilêmin  
diçêrin evîn canê  
bûye demek  
ez û tenahiyê  
landika dûriyê  
dilorînin  
û qevdên kulîlkan  
li bejna helbestan  
dikim bihna  
êvarên gundê xwe  
ya ko ji demeke  
min bîn nekiribû  
ji nû ve ez vedigerînim  
bûye demek  
xewê ji çavan  
di qewrînim  
şevbihêrkên  
bîranînan  
bi rêdixînim

sibe tê di bûre roj  
demjimêrên  
êşan bi rêdixînim  
tenê li dergêhên  
hêvîyan didim  
ma wê dem vegere  
ko ez vê kovanê  
ji dil derinim  
evîn canê  
rojekê tu dibe  
çivîkek li kvçiya  
dil datîne .  
û rojekê tu dibe  
şepolek li kenarê  
dil dixîne .  
û rojekê tu dibe  
aramek hiş û balamin  
dikşîne.  
û rojekê tu dibe  
maçek peyalên  
lêvêmin dinoşîne  
û rojekê tu dibe  
evîndarek tîna  
eşqamin dişkîne  
û rojekê tu dibe  
leylanek li pêxwe  
min dixapîne.  
û rojekê tu dibe  
xewnek tûrê  
hêvya tu dirjîne .  
evîn canê  
dê ka were dîwarê  
dûriyê biherfîne  
ji êşên salên bûrandî  
ji dafên helbestan  
ji kêşeyên keseran  
ji bêdengiya dîdariyê  
min ji xwere .  
birevîne .  
evîn cane ■

## مشيئة الأقدار

بيوار عموكا

و شاءت الأقدار  
أن توقد في أرواحنا  
لهيب ناراً  
من تعاسة حظوظنا  
وشاءت أن تضعنا  
في بلاد أسوارها  
من نار ...  
حكماها من حديد  
وشعبها من جليد  
وشاءت أن لا تتصفنا  
حتى في عوائلنا  
التي تشبه لحد  
أنظمة حكمتنا  
الأباء دكتاتوريون  
والأمهات جبناء من جليد  
وشاءت أن ترمينا  
في معركة الهوى  
الأسوار من نار  
الحكام من حديد  
الأباء دكتاتوريين  
والأمهات جبناء  
والحبيبات قصابات سبق  
مثل الحرية الحمراء  
لا يتصدق بها أحد  
بل تؤخذ بالقوة  
معركة خاسرة  
لا نملك فيها ...  
أية حظوظ  
هكذا شاءت الأقدار  
أن لا تنتصر  
حتى في هواننا  
شاءت أن ...  
نولد محتلين  
و نموت محتلين ■



## Hêviyên winda

**Bêwar Girpirî**  
(Ebdulhekîm Muhemed)

Li ber ronîya çira  
Çar dîwarên ketî  
bê dar û bê derf  
pencera devbiken  
bandike stêr û exteran  
azerên li min bûye mêvan  
di vî serê bê sewdan de  
ramanan ji hev didizin  
Çîrokan ji hev re dibêjin  
ekûnekê çêdikin, ji çar dîwaran  
dîwarên xemilandî bê xeml û xêz  
xaç û selîbên şkestî,  
ji dema pêxember Isa ve  
silav, silav lêbin ...  
li ber zingilê zingar girtî  
bêware dêra malbata min.  
ev arama bê dawî, min dikujê..  
jiyan min dixapîne  
ax û sed ax ji bo te jiyân  
te çi kir û te çi nekir jiyân  
cîhan, mirovatî min disojn  
gerdûn di nav pelên exteran de min diveşêre  
dîroka bê bext min navejîne  
ji qirêja malzaroka xwe  
hêviyên winda çêdikê û dizê.  
ji hewara Laleşa kevnar  
avise bi êş...  
keda Zeradeştê kal bê çira ye  
şîretên ji pirtûka reş windane  
min nedît kes li wan digere  
lewma ne hatin xwendin bi tîpên helbesta min.  
êşa kotî...  
kovanan bi ser min de dibare  
parçe dikê arê çira  
ew çira bê ronî, li ber xwedida  
reş dike xaniyê xirabe

xaniyê wistiyayî li ber temen.  
pênûsa kor winda dibe li nav rûpelan  
rûpelên reş ji dîroka stirî û kelbeş  
bi axîn hewar dike hewar  
mîna banga ji minara mizgefta sipî  
li ber dergehê Kevirê Reş

الله أكبر

Çi dibe...

dane kuştin mirov û mirovatî  
hiştin ax bigirî  
bi navê Xwedê dikin... ..

أعوذ بالله

Çi hate serê min Muhemed pêxember bê şahidê min  
silavê Xwedê lêbin.

lê.. lê Izrayîlê mirinê bi ser can de digire  
laş li benda qerqerê sipî li goristanê dihêle  
hêstiran kes bi ser de na barêne

tu dibe gawireke, lawireke  
ji nav hovan derketiye  
konê reş pê dikene.

nahêlin bo min evîn  
evîna ciwan bê dek û ewan  
ji kela xortanî, li dibistan û zanko  
wêneyekê çêdikin,

ji rengê yara min  
ji bo evîn têde bê xwendin.  
û dil... ax dil,

Çi xweşe dil, çi geşe dil,  
ji evîna bi derd û kul  
mîna çavên keçka bi kil.

wiha dibe jiyana min  
pir dibin azerên min.  
dibêjim mirov û xwedîyan

bandikim dost û heval û gundiyan  
biçênin baxçê gulên  
Çîçek û nîsrîn û xecan.

lê mixabin her mirovek bi xwe ketiye  
mîna min ji derdan di revê û bi çavan digiriye  
û her di mînin hêvî, hêviyên winda

di tariya gora zinda  
da bibin xewnên şeva ■

الأخرى لم تستطع أن تخرج من إطار الذهنية الحزبية، على الرغم من أن الكثير من الصحفيين الكرد يعملون لدى وكالات عالمية، لكن على صعيد الصحافة والإعلام في روج آفا لم تكن قادرة على الارتقاء بمستوى ما يحدث على الأرض.

7- أنت من المهتمين بالسينما والأفلام الوثائقية من خلال عملك في الأفلام الوثائقية كمصوّر مع المخرج شيرو هندی، برأيك ماذا يمكن أن تفعل الأفلام الوثائقية؟ ومتى ستخرج الأفلام الوثائقية الكردية من حالة التقرير التلفزيوني؟ هناك نواقص معينة تحوّل دون إنتاج أفلام ذات قيمة أو يمكننا على الأقلّ تسميتها بالوثائقية؟

الأفلام الوثائقية ضرورية جداً، فهي من جهة توثق كل حادثة أو المواضيع التي يتم تناولها في الأفلام، ومن جهة أخرى تقوم بإغناء الرؤية البصرية من خلال عرض شهادات ووثائق وصور، الأفلام الوثائقية الكردية إلى الآن تعتمد على الشكل فقط (مخرج، مصوّر ومونتير)، وهذا الأمر يرجع إلى أن غالبية العاملين في هذا المجال غير مختصين، لا بل حتى غير ملّمين بكيفية صناعة الأفلام الوثائقية. على العموم المشاكل التي تحول دون إنتاج أفلام وثائقية ذات قيمة تكمن في عدم وجود شركات إنتاج مختصة في هذا المجال بالإضافة إلى عدم توافر الكادر المختصّ وبعض المشاكل في المجال التقني، إلى الآن كل الأفلام الوثائقية التي أنتجت هي عبارة عن محاولات فردية.

8- كلمة أخيرة خوشمان؟

نحن بأمرّ الحاجة إلى منهج نقدي في كل المجالات حتى نتحرر من حالة الفوضى التي تشوب كل المظاهر وعلى كافة الأصعدة، إلى الآن لا نستطيع أن نعيش لنمارس حقوقنا حتى إن توفرت لنا.



الكاميرا قلماً.

5- الحالة الثقافية الكردية قبل اندلاع الثورة في سوريا كانت مشتتة وغامضة الملامح بحكم القمع ولكن بعد اندلاع الثورة بدأت تتوضّح هذه الملامح شيئاً فشيئاً، السؤال: ما هي نظرتك إلى الحالة الثقافية الكردية الراهنة وعلى الأخصّ في قامشلو؟

الحالة الثقافية الكردية الراهنة هي في أسوأ مراحلها، نعم الحالة الثقافية الكردية كانت مشتتة قبل اندلاع الثورة وبقيت كذلك حتى بعد الثورة، هذه المرة أيضاً من القمع (المبرر الجاهز دوماً) لكن دون أن يسأل المثقفون الكرد أنفسهم ولو لمرة واحدة عن مهمة المثقف ودوره في المجتمع، حينها لم يكن ليهربوا وهم حاملين أسماءهم الحبلى بخيبتهم.

6- سؤال عن الصحافة خوشمان، الكّل يعلم مدى التجاهل الذي تلقاه الصحافة في روج آفا في الوقت الذي نهتمّ الأطراف السوريّة الأخرى بهذا الكائن الفعّال، ما هي الفوارق بين الحالة الصحفيّة السوريّة (البديلة طبعاً) وبين الحالة الصحفيّة الكردية على وجه الخصوص؟

الصحافة بشكل عام لم تأخذ شكلها المهني التام في سوريا، قبل الثورة النظام لم يترك المجال للعمل الصحفي إلا عبر مؤسساته، لذا المهنية كانت غائبة تماماً، بعد الثورة تم تأسيس ما يسمّى بـ (الإعلام البديل) عن طريق منظمات دولية تقوم بتمويل مشاريع إعلامية وصحفية تكون قادرة على تجسيد فكرة الثورة وفي نفس الوقت تكون بمثابة البديل لإعلام وصحافة النظام السوري. وقعت بعض الصحافة والإعلام البديل في مصيدة تأجيج الصراع الطائفي في سوريا (عن قصد أو دون قصد)، ولم تستطع أن تخاطب المواطن السوري بعيداً عن انتماءاته، بالنسبة للصحافة الكردية هي





## حوار مع الشاعر خوشمان قادو

حاوره: جوان تر / قامشلو



• خوشمان قادو، شاعر شاب يحاول قدر الإمكان إيصال رؤيته إلى الآخر بلغته المكثفة، شاعر وصحفي يكتب باللغتين العربية والكردية، له ديوان شعري بعنوان ( انظر إليها كم أنت مرهق) والذي نال جائزة الملتقى الثاني لقصيدة النثر في القاهرة خلال العام ٢٠١٠ كما صدر الديوان عن دار ( الكتابة الأخرى) في القاهرة أيضاً عام ٢٠١٠، وله أيضاً مجموعة قصصية باللغة الكردية بعنوان (QOLINC) كما يكتب في الصحافة الكردية والعربية ومحرر في مجلة (شار) بالإضافة إلى عمله في مجال التصوير عن تجربته كأنه لولات هذا الحوار معه :

١- بداية خوشمان، أود أن تتحدث عن كتابة الشعر، ماذا تعني لك كتابة الشعر على الصعيد النفسي؟

الشعر حاجة ضرورية للإنسان، كل إنسان في حياته كثيراً ما يتفوه بكلام يبدو رائعاً (كصورة شعرية)، سيما الأناس الذين هم خارج دائرة الجو الثقافي، أما كتابة الشعر فهو مرهق إلى حد ما، لكنها بالنسبة للشاعر تغدو مثل أي شيء يبقيه على قيد الحياة، رغم أنه قد يتسبب في تأثير غير مباشر على نفسية الشاعر نفسه، والتي تظهر من خلال التصرفات وفط معين من المظهر.

٢- سؤال اعتيادي، الكثير من كتّاب وشعراء اللغة الكردية ينتقدون الشعراء الكرد الذين يكتبون باللغة العربية، برأيك هل هذا الانتقاد لائق أم لا؟ وما هي نظرتك إلى هذا الانتقاد؟

علينا أن نفرق بين أن نقصد الشعراء الكرد الذين يكتبون باللغة العربية من ناحية اللغة، وبين أن نقدهم من ناحية الشعر، الأولى تصل إلى حد التهجم أحياناً، على الرغم من ضرورة نقدهم في هذا المجال لكن دون أن نجعل ذلك همناً الأول والأخير، لأنهم لا يستطيعون التغلب على التفكير باللغة العربية، مع العلم أنهم يترجمون ما يحملون من مفاهيم خاصة بالمجتمع الكردي إلى اللغة العربية، وفي هذا الأمر أيضاً هم لا يستطيعون التغلب على الحس الكردي في ذاتهم.

٣- خوشمان، حضرتك تعمل في الصحافة وتكتب القصّة القصيرة بالإضافة إلى كتابة الشعر وباللغتين العربية والكردية برأيك أي اللغتين أقرب إلى قلبك وما السبب؟ أو بطريقة أخرى، كيف يمكن لك أن تجمع بين اللغتين أثناء الكتابة أليست هناك صعوبة ما من الممكن أن تشرحها؟

بالتأكيد اللغة الأقرب إلى قلبي هي لغتي الأم-الكردية- لكن دون أن ألغي أي لغة أخرى أو أمنع نفسي من تعلم لغة أخرى، وأجد نفسي ملزماً الكتابة باللغة الكردية لما تعرّضت لها من محاولات قتلها في داخل كل كردي من قبل الأنظمة التي حكمت الكرد، كما أن الكثير من المثقفين الكرد لم يكلفوا أنفسهم عناء تعلم اللغة الكردية متحججين بأسباب عديدة.

بالنسبة للكتابة بلغتين، عانيت بعض الصعوبة في البداية، طبعاً ثمة إشكالية أولية وهي بأية لغة ستفكر قبل أن تكتب، لكن فيما بعد لم أجد صعوبة أبداً لأنني بتّ قادراً على التفكير بأي لغة قبل أن أكتب.

٤- كنت تعمل كمصوّر في الفترة الأخيرة، إلى أي مدى يمكن ترجمة علاقتك

بالكاميرا، إذا اعتمدنا على التعريف التالي للشعر: الشعر هو تخليد لحظة معينة من الوجود كتابية.. أو مثلاً ما هي أوجه العلاقة بين ممارسة التصوير وكتابة الشعر؟

الكاميرا فُرّضت علي، ووجدت نفسي مجبوراً على التعامل مع الكاميرا، على كل حال الكاميرا ليس هاجسي في الحياة، كلانا يحملان بعض الصفات التي تتناقض فيما بيننا، لكن العمل على الكاميرا أكسبني إحساساً ورؤية جديدة للأشياء، مطابقة الألوان الموجودة في المشهد المراد تصويره (من خلال عين المصوّر) مع الألوان التي تظهر على شاشة الكاميرا (من خلال عين الكاميرا) معتمداً في ذلك على قاعدة في التصوير وهي (العين تخدعك).

وتجد علاقة جمالية وحسية بين ممارسة التصوير وكتابة الشعر، خاصة حين يغدو الكاميرا عين الشاعر نفسه، و ثمة نتاج متميز لهذه العلاقة، وقد ظهرت لدى المخرج الإيراني عباس كيورستامي. بالنسبة لي أيضاً كان التصوير موجوداً في كتاباتي مؤخراً واستطعت أن أجعل من

**خوشمان قادو لولات: إلى الآن لا نستطيع أن نعيش**

**لنمارس حقوقنا حتى إن توفرت لنا.**

**الكثير من المثقفين الكرد لم يكلفوا أنفسهم عناء تعلم اللغة**

**الكردية متحججين بأسباب عديدة.**

**الصحافة الكردية هي الأخرى لم تستطع أن تخرج من إطار**

**الذهنية الحزبية**

# Kobani

## ji nûve jîn dibe

### Şîrîn Temo



**Ê** rîşa hov ya ku şênîyên Kobaniyê ji bajarê wan derxistin û ew li bêtirî çihêkî, li bêtirî welatekî, li ser nexşa derbederiyê belav kirin, û hişt ku şênîyên Kobaniyê di nîrên penaberiyê yê çetin û dijwar de bijîn û zarokên Kobaniyê ji xwendin û dibistanên xwe bêpar bibin, herwiha gelek ji wan zarokan ji dîtina bavên xwe bêpar bûn, ji ber ku ew bav tevî hêzên Kurdî yê di bajêr de li berxwedan bûn û gelek ji wan, berî ku êrîşkerên DAIŞ di bajêr bişkên û jê derkevin, şehîd ketin.

Ji ber vê; gelek ji zarokên Kobaniyê dê derdê sêwîtiya ji bavê de bikşînin, lê ew derdê sêwîtiya ji welêt (Kobaniyê) de nakşînin.

Xelkên Kobaniyê derdê penaberbûnê 134 rojan kişandin, 134 rojan çavên wan li ser rîya vegeerê man, li ser bajarê wan Kobanî man, bajarê ku ji dûr ve, li ber çavên wan dişewitî û wêran dibû, ta 26 / 1 / 2015an, roja ragihandina rizgarkirina bajarê Kobaniyê, ew rizgariya ku wan bi tilêlî û lîlandinan pêşwazî kir. Di roja 26 / 1 / 2015an de, alên Kurdî li ser kaşê Miştênûr û girê Kaniyê li ba ketin, di wê rojê de û rojên di pê re, gelek ji xort û keçên Kobaniyê ji warên penaberîya xwe ji Serxetê, ber ve bajarê xwe herikîn, ta ku beşdar bibin di paqijkirina bajêr de û di pêşkêşkirina xizmetîyan, her yek li gor pîşeya xwe, û li gor karîna xwe.

Piştî rizgarkirina bajarê Kobanî şer dakete gund û gundewarên Kobaniyê, û êdî jiyan li bajêr ji sîberên metirsîyê derket. Desteya ji Nû Avakirina Kobaniyê hate ragihandin, û hemû keç û xortên Kobaniyê yê li derveyî welêt (Kobanî), û yê nîspor û karzan hatin vexwendin ji bo werin bangewaziya bajarê xwe yê wêranbûyî û karkirin bi awakî rekûpêk ji bo ji nû avakirina Kobaniya xwe, ta ku aliyên xêrxwaz alîkariya

wan, bi bexşandina pereyan, dikin, ji bo ku careke din ew vî bajarî efsaneyî ava bikin.

Lêkolînerê abûrîzan Mûsa Besrawî dibêje: "Min wek abûrîzan di "Desteya ji Nû Avakirina Kobaniyê" de di warê amarkirin û nirxandina ziyarên ku ji ber derbên firokên Hevpeymanan û ji ber derbên top û hawinên DAIŞ, gihîştî bajarê Kobaniyê de, karkir. Di vê desteyê de 13 komîte hatin çêkirin, her komîteyekê, ji alî amarkirina ziyaran de, serperîştî li ser taxekê dikir, Deste dê li dawiyê encama karê xwe, wek belge, pêşkêşî aliyên dewletî û navdewletî û rêxistinên xemxur bike, belkî ku ew alî alîkariyeye diravî ji bo ji nû avakirina Kobaniyê pêşkêş bikin".

Li ber dîmenên Kobaniya wêranbûyî, ew dîmenên ku zû xwe gihandin xelkê Kobaniyê yê penaberbûyî, li ber wan dîmenan ew xelk di deryaya xeman de noq bûne, û destên xwe ne dan ser hev û li cihê xwe rûnenişt, lê wan xwe ji bo vegera li Kobaniyê tev daxistin.

Her roj bi sedan mal û malbat piştî xwe didin penagehên xwe û li Kobaniyê vedigerin, vedigerin bajarê xwe, gundên xwe, vedigerin malên xwe ta ku beşdar bibin di paqijkirina malên xwe de, di paqijkirina taxên gund û bajarê xwe, ta ku deriyên mal û deriyên dikanên xwe vekin; ji bo ku jiyan careke din derbasî malên wan be û derbasî bajarê wan be. Di vê derbarê de, xanim "Diya Alan" -ew yek ji kesên ku vegeryayî Kobaniyê ye - dibêje: "Me mizgîna rizgarkirina Kobaniyê bi şahiyêke bêhempa pêşwazî kir û me tavilê xwe ji bo vegeerê tev daxist, em ji malên herî pêşîn ên ku vegeryayî Kobaniyê ne. Li vir, li Kobaniyê em pêrgî malbatên ku di dema şer de ji bajêr derneketî bûn, wan ji me re çirokên xwe û şer gotin, û qala ew nîrên gelek dijwar ku ew tê de jiyayî kirin, ew ji bo me pêşengîn, pêşengîn di berxwedanê de". Diya Alan gotina xwe berdewam dike û dibêje: "Min rabû mala xwe ya ku parek jê wêran bûyî paqij kir, û hevjinê min dikana xwe çak û pak kir, ji ber ku em jî dixwazin, bi qasî xwe, beşdar bibin di vegeerîna jiyanê de bo Kobaniyê".

Eliktirîka li Kobaniyê heyî ji Ceneretoran tê, herkesê ku destê wî dighêje ceneretorekê ji mala xwe re dikire. Av; tenê ava bîrên malan e, hema her maleke Kobaniyê bîrek xwe li ber heye, lê piraniya wan bîran miçiqîne, bê av in, lê îro herkesê ku bîra wî bi av e, çîranên xwe tî nahêle. Ev hinek ji rewşa ew para biçûk ya ku ji Kobaniyê ji ber devê destarê şer hinekî saxlem filitiye, hema yê ku malên wan bi temamî hilweşiya ne niha ji wan re kon, li rojavayê bajêr, têne



## Pêşwaziya Buharê

Alan Alûcî

**P**îştî zivistanek e bi xêr û bêr û barîna rêjeyek e baş ji baranê, dîsa bajarê Amûdê kirasekî kesk li laşê xwe digire, û keziyên xwe bi kulîlkan dihûne, ev jî mizgîniya hatina demsala Buharê ye.

Demsala Buharê di 21 ê avdarê destpê dîke, ew jî dikeve 1 ê Newrozê bi dîroka Kurdî, wate serê sala Kurdî ye.

, têde xelk bi cilûbergên gelerî pêşwaziya vê cejnê dikin.

Bi derbasbûna meha avdarê re, ne tenê kulîlk li beyaran vedibin, lê kul û êşên me Kurdan jî pêre derdibin.

Li bajarê Amûdê xelkên wê her sal bi germahî pêşwaziya buharê dikirin, her kes li gorî kêfxweşiya xwe pêşwaziya vê demsalê dikin bi seyran, stran û awazan.

Di demsala Buharê de, zeviyên Amûdê pir geş

û ciwan dibin, lewma xelkên Amûdê berê xwe didin zeviyên ji bo bêhnvedanê

Di nav zeviyên de gelek cûreyên pincaran şîr tîne, hin ji wan wek dermanên surîştî tîne bikaranîn wek babûnic, gîhasêvk, tolik û ji bilî wan .., hin ên din ji bo xwarinê tîne bi karanîn, ew ji bo tenduristya mirovan pir bi sûdin.

Buhara îsal li bajarê Amûdê salên berê yê bi xêr tîne bîra me, cotyar jî pir kêfxweşin, dibêjin ku îsal rewşa çandinyê pir baş e, baran a îsal jî pir baş bû.

Her kes li vî bajarî kêfxweşiya xwe bi hatina buharê derdibrîne, nexasim Buhara vê salê ya bixêr û bêr û pir bi sevizayî. ■

Wênegir: Efsan Kurdi

17



### Kobanî ji nûve jîn dibe (berdewamî)

vegirtin, bi gotineke din mafir ku ew mal dê di konan de werin bi cîkirin, bila li ser axa bajarê xwe Kobanî ne bajarên xelkê di konan de rûnin.

Hêjaye gotinê ye ku Kobanî tevî gundên wê, hîn ji herçar aliyan de dorpêçkirî ye, lewma pêdiviyê wê ye mezin bi kerîdoreke mirovahî ji aliyê Bakur (Tirkîyê) de heye ji ber ku dergehê sînor ji alî Tirkîyê ve bi awakî fermî naye vekirin, tenê hinek bazirgan dikarin pareke biçûk ji pediviyên Kobaniyê jê derbas bikin, meger ku ew bazirganên keysbaz her tiştî buhatir ji nîrxê wî bi du-sê qatan difroşin, di vê derbarê de dikancî Mihemed Imer dibêje: "Bazirgan sûdeyê ji xizaniya bazara Kobaniyê û mîtiya gèresteyan li wê bazarê digrin û her geresteyekî bi nîrxê ku ew dixwazin difroşin me, û em jî - wek dikancî - neçar dibin ku her tiştî bi heman nîrxê ku em pê dikirin bifroşin, tenê sûdeyek sivik em dixin ser".

Lê tevî wêranbûna piraniya malên vî bajarî, tevî wêranbûna dibistanan û derbasbûna saleke xwendinê di ser zarokan re, tevî ku gelek mal û malbatên bajêr xwîna kur û keçên wan li ser axa vî bajarî rijiya, ta ku ew xwîn bû pirek dirêjkirî ji kenarên penaberiyê bo kenarên Kobaniyê, û kenarên rizgariyê, tevî hemû diwariyên jiyane li vî bajarî bajarê Kobanî; Kobaniya wêranbûyî, Kobaniya ku ti binemayên jiyane lê nemayî, tu dibînî xelkên wê li ser axa bajarê xwe serbilind in, serbilind in ku ev bajar; bajarê wan e û ev malên wêran malên wan in, û ev xwîna rijiyayî xwîn zarokên wan e û ev serkeftin, ev serkeftina ku li seranserî cîhanê deng dayî, serkeftina wan e.

Wek eniya Sîpan û Agirî, bilinde eniya xelkê Kobaniyê û girmijîn her li ser lêvên wan wek ava Ferat û Dicle diherikin, û hêvî di çavên wan de wek stêrkên di kezeba ezmanekî eyaz û sayî de geş dikin û ew sur in, sur in ku bajarê xwe- careke din- bikin bajar, bikin bûka bajar. ■



## Kovara Welat li Girkê Legê

Gulal liyanî

**E**v du sal li ser demzirandina kovare welat derbasdibin, ev du sala kovar li seransrî bajarê kurdî tê belavkirin, yek ji wan bajara Girkê Legê ye, bi vê bonayê nerînên xelkê Girkê Legê li ser kovara Welat di vê rapirsîne de diyar dibin.

**Faxir ferho** : Ez di bînim ku kovara welat rolek berz û bilind di pêşve birina çand û zimanê kurdî de dileyzê, ji hêla derçûna hunerî ve bi renekî spehî derdiçe, ez yek ji xwênerên kovara welat, hêvîya serkrftinê jê re di kim û diwemîn salvegara wê li we û hemî xwêneran pîroz dikim.

**Berzan hisên** : ji encamên giringiya şoreşa sûryê avakirina gelek dezgehên raghandinê di hudirê herêma kurdî û derfeteke mezin ji çand û zimanê kurdî re hate vekirin, kovara welat yek ji wan sitûnên ku xwe girt û ta niha çapkirina wê berdewame piştî du salan ji demzirandina wê ez hêvîya serkevtinê û berdewamiyê jê re dikim.

**Lewend kardoxî**: navê kovarê welate, ji lewre pêwîste ku li pirsgerêk û kul û derdên welatiyan, karîn, raman û gavînen wanraweste.

Û çalakiyên welatiyên afrender berçav û ronî bike, pir caran bi tîpên hûr jî tê weşandin.

Di van hejmarên dawî de, mijarên wê bêtir siyasî bûn, ez dibînim ku mijar çandî bin wê bêtir were xwendin û guhdan jî ji hêla xwêneran dê pê bibe.

**Idrîs Hiznî** : kovara we hêjaye, dewlemende, giştîye, guhdanê li çand û zimanê kurdî dike ji siyastê dûre, bêtir li ser pêrisgiriêkên herêmên kurdî radiweste, bi boneya diwemîn salvegara kovara welat, ez serkeftin û berdawemiyê jê re dikim.

**Cihad Emo**: Ez spasiya dezgeha welat a ragihandinê û desteya rêvebir a kovarê dikim li ser vê weşana nirxdar û spehî ku bi zimanekî şêrîn û rewan û derhênaneke xweşik tê weşandin, kul û êşekên herêmên kurdî bi pirsporî tînen şopandin ji bilî kû xizmeta ziman û çanda kurdî jî dike, birastî kovara welat hêjaya ku derbasî her malakê bibe, û diwemîn salvegara wê li hemî karmendên vê dezgehê pîroz dikim. ■



## Kovara Welat û vedenga pêvajoyê

Lawikê Romî

**B**i helkeftina derbasbûna sala sêyem ji damezrandina Dezgeha Welat a Ragihandinê û derketina yekem hejmar ji kovara Welat,tevî belavkirina li bêtirî neh bajarên Kurdî,ji wan bajarê Serê Kaniyê ye,ku ji berî du salan ev bajar beşdar dibe di vê kovarê de û şanaze bi parvekirina wêneyên surîştê û tevgera mîlet,û bi belavkirina raporên ji hemî rewşên ku ev bajar têde derbas dibe.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku kovara Welat yekemîn kovara Civakî-Gîştî û Serbixwe ye ku tê belavkirin li seranserî bajar û bajarokê Kurdî,û belê zayina vê kovarê ji meha Nîsanê destpê bûye,hevdema bîranîna salvegera cejna rojnamegeriya Kurdî ye.

Li ser vê sebarete,û li heman mijarê de di dermafê kovara Welat, mamosta Azad

Eyanê yek ji baldêrên pêvajoya Welat e li Serê Kaniyê,bo me wisa axivî:

"Derbasbûna sala sêyem bo Welat ez pîroz dikim,em kêfxweşin bi vê berdeyamîyê û serkeftina bêsînor ji hêla ciwanên me li seranserî bajarên Kurdî,û em hêvî dikin ku her û her berdeyam bimînin,û her serkeftî bimînin."

Ji hêla xwe ve jî,mamosta Umer 'Emo ji bo vê helkeftinê ji me re diyar kir:

"Ez dilşad im ku dibînim Welat ji berî du salan de guhdana rewşa civakê û ciwanan dibe,bi rastî ev cihê vehesiyê ye ku Welat serbixwe maye,û dîmenê civakê bi rastî û zelalî pêşkêş dike bi xwendevanan,ez serkeftinê ji teva karmendên kovarê re dixwazim,û hêvî dikim ku roj bi roj Welat wêneya welat be,wek ku me wê naskiriyê"

Û li ser vedenga kovarê di hêla wejeyî û rojnamegiyê de,rojnamevan Ebdul-helîm Sulêman wilo axivî û got:

"Rojnameya Kurdî li Sûriyê ji piştî şoreşê de,li bajarê Kurdî roj bi roj pêşdikeve,û kovara Welat yek ji sedemên serekî ye bo vê pêşketinê,di riya gotar,helbest,rapar û nivîsên wêjevan û ziman zan û lêkolînavan,ez pêşerojek serkeftî ji dezgeha Welat re lava dikim û dixwazim".

Bi van şîrove û lavayan jimarek ji mamosteyên Serê Kaniyê pîrozbahîya kovara Welat kirin,di sersala sêyem a kovara xwe -Welat- û hêviya berdeyamîyê ji wê re kirin û xwestin. ■





## Şûnwar li Qamişlo


Rapor: Ciwan Teter

Wergerandin: Xunav Kano

**B**erî ku şoreşa Sûryê li tevahiya deverên wê li dar bikeve, hin destek ji bo diziya şûnwaran bi rengê rêxistinkirî û hevkarîkirî di navbera kesên ji van destekan û hin kesên dest dirêj di rêjîma Sûryê de, ji bo revandina şûnwaran ji derveyî sînorên Sûryê, lê tiştê niha çêbû û bi awayekî diyar û pir, bi taybetî piştî lidarketina şoreşa Sûryê û nakociyên ku niha li ser xaka Sûryê di navbera hemû aliyên de çêdibin, ew e diziya şûnwaran ji hin aliyên nediyar ve, herweha pevçûnên dijwar di navbera tevahiya aliyên nakok di Sûryê de, di encamê de gellek avahiyên kevnaar tên wêrankirin, weke hin taxên Himsê û Heleba kevin herweha hin parêzgehên din yê Sûryê, ji ber gelek ji deverên kevin yê Sûryê yê vedgerin sedên salan, ew hemberî agirê çêkên hêzên rêjîma Sûryê bûn, bi mehna ku çekdar li wê deverê cih digrin, li gorî ragihandina Sûrî ya fermî, herweha tê diyarkirin ku gellek deverên kevin bûn nêçîr ji rêxistinîna qaçaxçiya şûnwaran, û qezenc ji rewşa ewlehî ya Sûryê dikin...

Raporên rêxistina YONÊSKO ya cîhanî diyar dike ku behaneya jimara şûnwarên qaçaxkirî dighên du milyar dolar, di nav tawanên bedel di navbera rêjîma Sûryê û opozisyonê de, herweha raporeke Waşinton post diyar dike ku artêşa azad bi karê diziya şûnwaran û firotina wan radibe, ji bo piştigirîya xwe ya diravî bike, herweha bo peydakirina çekan, û ev tişt bandorê li ser mîratê Sûryê û şehîristaniya wê dike û wê wenda dike...

Nediyarbûnek di kiriyarên qaçaxkirina şûnwaran de heye, nemaz e li navçeyên kevnaar yê agirê şer giyaye wan, piranaya raporên diyar dikin ku hêzên rêjîmê berpirsiyarê yekemîn e di wêrankirina avahiyên kevnaar de, weke bombebaran û wêrankirina ku li keleha Kerk ya navdar kiriye, û ew ji navdartirîn keleh e li cîhanê, Herweha hin ji deverên kevnaar bûn



cihên perwerdekirina hêzên nakok li Sûryê, weke girê Mozan yê kevnaar li parêzgeha Heseke, ji ber ew ji devereke kevnaar bû qîşleyek leşkerî ji hêzên parastina gel YPG ve, û ev tişt li ser gellek deverên din yê kevnaar piraktîk dibe, herweha diziya ku rêxistina Islamî Daişê li Serê kaniyê kiriye, ji ber li wê navçeyê gellek şûnwarên Asûrî û Suryanî hene ku vedgerin hezarên salan, û li ser rewşa şûnwaran û parastina wan li parêzgeha Heseke,

Endamê desteya şûnwaran mamoste "Azad Umer" ji kovara Welat re axift û got: "anha piraniya deverên kevnaar di destê hêzên YPG de ne, û ew berpirsiyarên parastina şûnwaran li vê navçeyê ne, me têkilî û hemahingî bi wan re kir ji bo şûnwaran û parastina wan, herweha em zagona Sûryê di parastina şûnwaran de bikar tînin, û ew heman zagona cîhanî ye, ya dibêje bi nebûna pelandinê bi deverên kevnaar, di dem û cihên şer de, herweha em hewl dikin ku her tiştên girêdayî bi şandeyên şûnwaran û karê wan, di demên derbasbûyî de, bînin vê navçeya aştiyane, ji ber gellek navçe hene belkî şer û êrîş li ser wan bînin kirin, û her perçeyek tê pêşkêş kirin bo me li gorî pirtûkên fermî tê pêşwazîkirin, û kîjan rêxistina pîspor di parastina şûnwaran de dikare ji vî tiştî teqez bibe...


Û di derbarê kirdarişên parastinê yê dikarin bikar bînin, "Umer" dibêje: kirdarişên niha divê ber bi bîrewerkirina civaka Sûrî bi giringiya şûnwaran ve biçe, ji ber di dawiyê de ev şûnwar ên Sûryê ne, û piraniya kesên ziyarê li şûnwaran dikin, kesin ji civaka Sûryê ne, çî ji aliyê rêjîma Sûryê ve an ji aliyê opozisyonê ve.

Lê divê were pirsîkirin, gelo çareserî ji bo nehiştina wendabûna van şûnwaran çî ye?

Birêz "Mehmûd Ese'd" derçûyê zanîngeha wêje û zanistên mirovahiya beşê şûnwar û mozexaneyan dibêje:

Divê dema niha de tu kes nikare parastina şûnwaran bike, ji ber berî şoreşa Sûryê ev tawan hebû bê ku dezgehên pîspor bikaribin van toreyên pîspor bi qaçaxkirina şûnwaran bigrin, ji ber têkiliyên van toreyan ên fireh, herweha hin aliyên hikûmetê jî hevkar bûn di vê tawanê de, di nerîna min de ev tişteke aloz e herweha zêdetirî 400 hezar perçeyên kevnaar di dema şoreşê de hatin dizîn, ew jî jibîlî wêrankirina dêrên ku vedgerin sedên salan, wek tiştê ku li Malûla û jibîlî wê ji navçeyên Sûryê çêbû, herweha metirsîn heye ku sinaryoya Îraqê li Sûryê were buhurandin, ji şewat û diziya şûnwaran, yê dîrokekê hildigirin, ji ber vê yekê pêwîst e aliyên navnetewî alîkariyê bikin, bo parastina vê kultura gewre... ■





## Zaroktiya Pîroz

Nezîha Ebûzêd

**B**ajarê Qamişlo mezintirîn bajarên parêzgeha Hesekê ye ji aliyê rûberiyê ve herwiha ji aliyê curbucurbûna xlekên bajêr,gelek ol û ntew ligel hev dijîn. Berya şoreşa Sûryê bajarê Qamişlo dihat naskirin bi ( Parîsa biçûk ) lê niha rewş hatiye guhertin,tevî hewldanên hin aliyan ji bo çareserkirina rewşa awarte ya ku welat têde derbas dibe,hêjî nakokî û têkdan bi awayekî fireh derdikevin,û welat ber bi rêyekek nenas de diçe.

Bê guman ev têkdan bandorek mezin li ser rewşa abûrî ya welat dike,ev yek bû sedema ku Li taxên Qamişlo û bi taybet li bazargeha bajêr bi renekî normal zarokên temenên wan biçûk kar dikin,hemû yasayên cîhanê rêkeftinek derbarê qedexa kirina karê zarokan li dar xistine. Zarokên ku ji ber abûriya wêran ji dibistan û xwendina xwe dûr ketine,dest bi karên giran dikin ta ku bikaribin bijîin,ev berjeng berya şoreşa Sûryê peyda dibû lê ne bi qasî dema anha çimkî gelek ji xelkên ku anha li Qamişlo dijîn ji parêzgehên Sûryê tevî,koçber bûne û hatine bajarê Qamişlo bi doza jiyaneke aştiyane,lê ew rastî aloziyên bêtir hatin,yek ji wan rewşa abûrî ya zehmete ku ew zarok neçar kirin ku zaroktiya xwe nejîn û derdê koçberiya xwe bikşînin di temenekî biçûk de û bi erkê mirovên mezin rabin û dest bi kedê bikin.

Bê guman ev diyarde bandorek xurt li tendurustiya zarokan dike û di hin caran de dema ku kar ne li gorî fîzyolociya zarokan be dihêle di pêşerojê de ew seqet bibe. Berêz

muhemed yê ku nikare kar bike ji ber ku seqete,neçar bûye gerekdar bi her du lawên xwe yên 10 salî û 12 salî bike da ku endamên mala xwe xwarin bike û pêwendiyên jiyanê ji wan re pêşkêş bike. Herwiha,muhemed got ku lawên wî ji dibistanê û ji zaroktiya xwe dûr ketine,û ev yek gelek ziyar gihandiye jiyana wan teva lê tu çareyek din nebû. Metirsiyên karê zarokan ji aliyê mezinbûna Seykolocî û Fîzyolocî gelek hene,derbarê vê mijarê de rêberê civakî di dibistanekê de Mehmûd Ebdullah got : Gelek zarok ji dibistanê direvin piraniya van zarokan ji bo kar yan jî ji bo koçberiyê bi doza başkirina rewşa xwe ya abûrî,berdewam kirina vê berjengê wê bibe sedema paşketina xelkên Sûriyê bi temamî û pêşerojek ne diyar,Çimkî pêşketina gelan bi pêşketina civakê ye ■



## Tîror nikare vîna jiyane bişkîne

Salar Salih

**B**îstê avdarê,êvara cejna newrozê şahî li taxa Miftî lidarketin,kêfa zarok û dayikan,kêfa gêncan keç û lawan bi destê tîroristan bînpê bû,dîsa taxa Miftî qelenê azadiyê ji xwîn û laşê zarokên xwe giranbuha da,piştî ku cara yekem di 16 meha Avdarê sala 2013 an avêjtokên hawin li ser malên sivîlan li taxa Miftî ketin û di encamê de du welatîyên sivîl jiyana xwe ji dest dan û pênc birîndarbûn ku hemû ji malbatekê bûn,lê vê carê komkujî mestir bû,bi destên tîroristên rêxistina Da'îşê yê nijadperest û şovînzîm,tenê çend kêlik bûn hiştin ku ken û kêf û şahî bibin agir û girî û xwîn.

Beriya ku şahî dest pê bibe,Da'îşê gef li miletê Kurd kiribû ku wê şahiyên Newrozê bike armanc ji êrîşên xwe re,li tevî ku ev agahî li nik her kesekî hebûn,lê nişteciyên vê taxê beşdarî ahengê bûn,bi coşek mezin ber bi qada ahengê ve diçûn ji bo ku agirê Newrozê geş bikin,li dora pertewa Newrozê giroverek çêkirin,sema û dîlan dikirin,ewqas ji jiyane hezdikirin, ji Newrozê hezdikirin,hemûyan silav li hev dikirin û Newroz li hev pîroz dikirin bi kêf û şadî,lê mixabin Newroz bê gorî di ser miletê Kurd re derbas nabe,her sal divê ku qurbanîyên Newrozê hebin,destê tîrorê yê qirêj derbasî nava ahengê bû û kenên zarokan dizî,lîrlîrên dayikan temirandin,sema qîz û xortan belawela kirin,parçe kirin,xwekujekî laşê xwe yê bombekirî di nava ahengê

de teqand,û xwekujekî dîtir bi turumpêleke bombekirî derbasî nava ahengê bû,bi dehan pakrewan û birîndar,fermêskên dayikan dibariyan,li ser kezebên xwe yê şewitî li ser berxên xwe yê serjêkirî,dayikên me dikirin hewar hewar,Helebça diwem e,taxa Miftî li Hesekê bi xwîna şehîdên Newrozê xemilî.

Şîniyên taxa Miftî bi merdbûna xwe hemû birîndar veguhêstin bo nexweşxaneyên bajêr,û bi coşek mezin hemû pêkhatiyên Hesekê çî Kurd û çî Ereb û çî Xiristiyan,berî dan xistexaneyan daku xwînê bidin û çî pêdiviyên dîtir,jiyana gelek birîndaran bi saya serê welatîyên Hesekê hat rizgarkirin ji metirsiya mirinê,di vê rojê de hat xuyanêkirin bê çiqasî pêwendî di navbera hemû pêkhatiyên Hesekê de xurte,û çiqasî şîniyên vî bajarî pabendin bi pêkvejiyanê û biratiyê li dijî tîrorê û tunûtîjiyê,li tev ku komên tîrorêst hewildidin ku vê pêkvejiyana aştiyane têkbidin,û bajarê me yê sibehî bişewitînin,lê hîn nişteciyên bajarê Hesekê hewildidin ku bajarê xwe biparêzin ji êrîşên tîroristan,û ew pabendin bi xak û bajarê xwe ve.

Birîna me kûr e,komkujiyek bêhempa bû,Helebça diwem bû,kesên ku sax jî man û ji komkujiyê filitîn,ew jî dibêjin ku em nîv mirî ne,em bixwe nizanin çawa hîn em sax in,lê cardî xelkên vê taxê birînen xwe derman kirin û bi moralekî bilind şehîdên xwe binaxkirin,û li birîndarên xwe xwedî derketin,dîsa jî wê jiyana xwe ya rojane berdewam bikin,û ew dibêjin ku tîror û gefên rêxistina Da'îşê ya faşîzîm nikarin vîna jiyane li nik me bişkînin. ■







## Bazara Sotemeniyê Li Hesekê...

Raman Îsa

belav dibûn, lê neha bi rengekî rêxistin kirî li nava vê bazarê karê xwe dikin.

Ji boyî agahiyên bêtir, di hevdîtineke Taybet de li gel kovara welat, bazirgan "Hesen Alî" diyar kir, ku beriya avakirina vê bazarê, pir astengî rastî karê me dihatin, lê neha, piştî daneheva beşekî mezin ji bazirganên sotemeniyê, em dibînin ku Karê me bêtir bi rêxistin bûye, lê tenê pisgirêkek heye, ku bazara me dûrî navenda bajêr dikeve, ev yek dibe aloziyek ji xelkên bajêr re.

diyar e ku hemû beşên sotemeniyê li vê bazarê berdest in, bi teybet her yek ji alavên, Banzîn, Gaz û Mazot.

herwiha jêdera anîna sotemeniyê, ji herêma Rimêlan e.

Li gor birêz "Mehmûd Ehmed" yek ji bazirganên e, anî ziman ku

em tevaya bermîlên xwe, ji bazirganên Rimêlan dikirin û li vê bazarê, bermîla Mazotê bi 8500 L.S tê firotin, herwisa ya Banzînê bi 11000 L.S û ya Gazê jî bi 11000 L.S em difroşin.

û pir Cudahî di navbera firotina li vê bazarê, û Firoşkarên hundurê bajêr de heye, ji ber li vir bi erzanî tê firotin.

Di dema ku Banzînxaneyên taybet bi tevahî hatine girtin, û pêdiviyên xelkê bi Alozî û buhayî tîn bi destxistin, diyar e ku her wesayetek barkirî bi sotemeniyê li vê bazarê, dikar e bi rola banzînxaneyekê rabe, û kirîna û firotina bi hêsanî tê kirin ■

**S**otemenî yek ji girîngtirîn Alav û pêdiviyên jiyanê ye, lê dema ku bi zehmetî bête bi destxistin, pêwîst e ku hin çare bînin e dîtin.

Jiber ku di herdû Salên bûrî de, nixê kirîna Banzîn û Mazotê gihabû astek e bilind, bi Taybet dema ku Banzînxane li Parêzgeha Hesekê bi karên xwe ranebûn, pirojeyek hate pêşkêş kirin,

ku Bazarek Taybet ji bo kirîna û firotina Sotemeniyê bê vekirin, ev jî bi Alîkariya Şaredariya Hesekê bû.

Ji despêka sala 2015 an ve, ev Bazar li başûrî bajêr hate avakirin

li nêzî Taxa " Mişêrfê ".


Di dema serdana bazara sotemeniyê de, û Şopandina Kar û barê kirîna û firotinê, hat xuyakirin ku ev piroje, çihê kêfxweşiya tevaya bazirganên vê bazarê ye, ji ber ku di demên çûyî de wesayetên sotemeniyê bi Şêweyekî bê ser û ber li kolanan





# أكتينو

## عيد رأس السنة البابلية الآشورية



يصدقون إن يحصل ذلك فعلا، ان ينزل ملك مدينة بابل العظيمة أو ملك الكلدانيين (حسب فترة الحكم) إلى موقع الركوع والسجود وطلب المغفرة بعد تجريده من سلطاته القوية، فيعدونه أمراً غير معقول، لا بل اكبر كذبة في التاريخ ولذلك شاع بين الناس أن يكذبوا في هذا اليوم، لان حتى الملك كذب فيه.

ختاماً فنحن في الأول من نيسان الجاري نكون قد دخلنا في عام 6765 حسب التقويم الآشوري والعام 7315 حسب التقويم البابلي، كما هو يوم 21 آذار عيد قومي عند الشعب الكردي وهو ذاته عيد الربيع ورأس السنة الفارسية حسب التقويم الفارسي وعيد شم النسيم عند الفراغة القدماء في مصر ■

وكيف جرت عملية اتحاد الآلهة على إن يكون مردوخ رئيسهم بعد إن قام بثورة على الإلهة تيامات - إلهة الأنوثة (جدته). إما الأيام المتبقية بالإضافة إلى الطقوس الدينية كان هناك فيها بعض مظاهر اجتماعية وسياسية.

إما كيف تحول عيد اكيو رأس السنة البابلية إلى يوم الكذب؟ فتلك قصة فيها الكثير من الغموض والأساطير والروايات غير الدقيقة.

البعض يقول إن الحدث ليس ببعيد وإنما قريب نسبياً، يعود إلى القرن السابع عشر حينما اتخذ الملك لويس الرابع عشر (1638 - 1715 م) ملك فرنسا من اليوم الأول لكانون الثاني رأس السنة المالية في فرنسا عوضاً عن الأول من شهر نيسان لأنه عيد وثني .

وحسب هذه القصة، أصر البعض الاحتفال بهذه المناسبة بعد إن لبسوا ملابس متنكرة وصبغوا أوجهم كي لا يتم التعرف عليهم من قبل جنود الملك، لما سمع الملك لويس السابع عشر أمر بإحضارهم جميعاً إليه. وعندما سألهم عن سبب قيامهم بالاحتفال وعصيانهم لأوامره، انبرى متكلم حاذق من بينهم قال للملك : يا ملكنا العظيم إننا لم نخالف أوامرنا وبالعكس حولنا هذه المناسبة إلى مناسبة تافه لا تستحق الاحتفال فيها، عملناها عيد مسخرة وكذب عن طريق لبسنا هذه الملابس الممزقة وهذه الإصباغ المزيفة، ففرح الملك عندما سمع هذا الكلام فلم يقطع رؤوسهم . ومنذ ذلك اليوم يطلق البعض عليه يوم الكذب عوضاً عن عيد رأس السنة التقليدية - عيد اكيو أو عيد عودة الحياة إلى الأرض بعد سباتها ستة أشهر (الشتاء) حسب أسطورة كلكامش، عشتر و تموز.

البعض الآخر ينسبها إلى قصص وروايات حديثة أخرى، مثل كذبة مشهورة عملت مشاكل بعد إن صدقها عدد كبير من الناس. من الأمثلة على هذه القصص هي الترويج الإعلامي الذي حدث في بداية القرن العشرين عن إقامة مؤتمر في نيودلهي لتوحيد الأديان والدعوة مفتوحة لحضور ممثلي جميع الأديان في العالم له، وحينما ذهبوا بعض الأوروبيين إلى هناك لم يجدوا أي شيء من هذا القبيل وإنما اكتشفوا كانت كذبة .

لكن القصة التاريخية التي يرجحها الكثير من تحويل عيد اكيو إلى يوم الكذب كما هي ما يحدث في اليوم الخامس من احتفال عيد اكيو، حيث يخلع الكاهن (الذي هو بمثابة اله مردوخ) التاج من رأس الملك ويأخذ الصولجان من يده ويخلع عنه رداء الملوكية ويأمره بان يركع أمامه و يعترف بخطاياها ويطلب المسامحة والمزيد من القوة والسلطة لنشر العدالة والحق بين الناس.

هذه الحادثة جعلت كثير من الناس الغرباء في الأمم الأخرى لا

## الأول من نيسان عيد اكيو أم عيد الكذب؟

محمد مير سعادة

**أكيو** بالسومرية: أكيي سنونم' ريش شاتين بالأكادية، هو عيد رأس السنة لدى الأكاديين والبابليين والآشوريين والكلدانيين من بعدهم. ويبدأ عيد رأس السنة الجديدة في اليوم الأول من شهر نيسان ويستمر لمدة اثنا عشر يوماً، يعود الاحتفال برأس السنة الرافدية في الأول من نيسان إلى السلالة البابلية الأولى، أي إلى مطلع الألف الثاني قبل الميلاد، إذ تم على عهد هذه السلالة العمورية ترتيب حلقات الحياة بشكلها شبه النهائي في حياة سكان بلاد ما بين النهرين سواء من الناحية الدينية أو الاقتصادية أو الاجتماعية.

من الجدير بالذكر أن تاريخ يوم السومريون كان يعتمد على عدة عناصر طبيعية وأهمها القمر، فقد كان معلوماً بأن شهر "نيسانو" (نيسان) يبدأ بحسب التقويم الآشوري بلبلة الاعتدال الربيعي، إلا أن المدونات الأثرية تبقى المرجع الأول والأخير ومنها الألواح المسماة في متحف لندن.

عند الشعوب القديمة كان الشهر القمري يبدأ مع القمر الجديد. من الجدير بالذكر بأن طول هذه الفترة كان حوالي 29 يوم و12 ساعة و44 دقيقة و3 ثواني يتوسطها اكتمال القمر مرة واحدة شهرياً، مما يعني بأنه لا يمكن تحديد تاريخ مرقم لرأس السنة الجديدة لأن القمر الجديد سيتغير تاريخه الرقمي كل سنة بالتقويم الحديث.

اكيو الذي تفسيره مشتق من الأسطورة البابلية عن الخلق، والتي تبدأ بالعبرة التالية : ( إينوما إيليش ) أي عندما كان في الأعلى، وهي صلاة طقسية لتخليد سيد الآلهة (مردوخ) الذي خلق الحياة والطبيعة.

في مدينة بابل القديمة، أي قبل ما يقارب خمسة آلاف سنة كان الاحتفال يقوم على أساس عودة الحياة إلى الطبيعة بعد إن عقد الاتفاق بين الآلهة جميعاً لتحرير تموز خطيب عشتر من العالم السفلي وحصول الزواج بينهما، فتعود الحياة إلى الطبيعة التي تمتلئ بضجيج و نشاطات الكائنات الحية من كافة أنواعها في موسم الإنجاب والتلقيح وتمو البذور.

كانت احتفالات عيد اكيو تدوم 12 يوماً، الأيام الأربعة الأولى منها هي لممارسة الطقوس دينية وتقديم الصلوات والذبائح وقراءة قصة الخلق (قصة الخلق البابلية)

## VÎTAMÎN(K)

**Dr. Abdulwahab Hacî**

**V**îtamîn K tê naskirin wek vîtamînê xwînmeyandinê ji ber ew rolek mezin di rawestandî û seknandina xwîna ku ji birînên laşê mirov der diçe digrê .

Navê zanistî yê vîtamîn K Nîftokînon e Nîftokînon an jî vîtamîn K bi xwe çar( 4 ) vîtamînin :

Fîlokînon an vîtamîn K1

Mîtatîtrînon an vîtamîn K2.

Mîtadyon an vîtamîn K3.

Mîtadiyol an vîtamîn K4 .

Pêdiviya laşê mirov a rojane :

Ji bo kesekî 25 salî 120 mîkro giram e .

Ji bo Jinek 25 salî 90 mîkro giram e .

Ji bo zarokan Ji 15 ta 50 mîkro giram e.

Çav kaniyên vîtamîn K :

Hemî pelên kesk wek( pelên Beqdunis-Sebanix ,pelên silka ,bokilên kesk ,Brokilî ,xes û hinek mêwe wek Kîwî û Avokado ) û di kezeba reş de bi awakî dipokirî tê dîtin

Di kezeba reş de vîtamîn K bi awakî depokirî û ne aktîv tê dîtin .

70% ji vîtamîn K di sistêma dahandinê de bi taybetî bi arîkariya bektêriyê bi sîd yê roviya zirav tê afirandin .

30% ji vîtamîn K. bi xwarina şînî û pelên kesk,laşê mirov sîde jê werdigre.

Karê vîtamîn K :

1. Bi awakî aktîv prosêsa avakirina pelikên xwîn meyandinê bi taybetî grûpa protrombîn pêktîne,û bi vî awayî dibe sedema rawestandî û seknandina xwîna ku ji birînên laşê mirov derdiçe.

2. Bi awakî aktîv protîna KALSÎN avadikê ,kalsîn bi xwe protînê berpirsiyarê derbasbûna kirîsteya kalsiyom (ca ) ta bigihe hestîyên laşê mirove, ji ber vê yekê heger vît. K. di laş de kême bibe wê mirov tûşî nexweşîya Ostêoperoz (hestî xûrûmandinê ) bibe.

3. Rola vît. K. di damezrandin û avakirina perdeyên di navbera şaneyên mêjî de heye.

Sedemên kêmbûna vîtamîn K.

wek me got ( bektêriyên bi sîd yê Roviya zirav,kezeba reş wek dîpoya vît. k ) rolên bingihîn di avakirina vîtamîn( k ) digrin,ji ber vê yekê hemî nexweşîyên roviya zirav û nexweşîyên kezeba reş dibin sedema kêmbûna vît.( k ) di laşde .

hêjayî gotinêye em bizanibin ku kesên antîbiyotîkan demek dirêj bikartênin tûşî gûlbûna roviya zirav dibin û ev dibe sedem kû bektêriyênem bi sîde yê roviya zirav beşekî mezin ji wan dimrin û mirina wan dibe sedem ku vîtamîn( k ) di laşde kême bibe .

Nîşanên kêmbûna vîtamîn K .

1. derketina xwînê ji bêvilê .
2. deketina xwînê ji ber diranan,ji nav perûyên diranan .
3. di dema birînan de xwîn demek dirêj ji wan birînan diçe û xwîn zû bizû ranaweste .
- 4.peydabûn û xuyanîkirina deqin sor û şîn li ser cermê laş dema tûşî derbek pir sivik bibe ■



# Vitamin K



## Xweşnav Heso

### PEYVA WENDAYÎ

(cenawer-sêv-arîn-şaristanî-dotmamê-kavkulîk-xal-sîlva-rênas-laleş-aras-dil-şar-lêv-şana-kovar-mûdar-şîn-av-xûn.)

s	ş	a	r	i	s	t	a	n	î
ê	b	k	o	v	a	r	r	e	d
v	ş	l	d	a	v	a	l	ş	o
r	x	a	ê	i	ş	i	î	r	t
e	s	û	n	v	d	n	a	û	m
w	a	n	n	a	r	d	m	x	a
a	n	î	x	s	î	l	v	a	m
n	ê	r	a	a	a	r	a	s	ê
e	r	a	l	ş	e	l	a	l	n
c	k	a	v	k	u	l	î	l	k

Peyva wendayî ji 8 tîpan pêktê, navê malbetek Kurd e, pir bi zanebûn û Kurdperweriyê navdare.

--	--	--	--	--	--	--	--

### XAÇERÊZ

Rast :

- 1-mehek ji mehên salê.
- 2-aramî û hêmenî(b)-dera pênasînê ligel mirov.
- 3-war(b).
- 4-cûreyek ji kulîlkan.
- 5-pêşîg, dergûş.
- 6-kesê ku bi gelek rûyan be.
- 7-tersê kevn(b)-sinc .

Serjêr

- 1-yek ji rengan-tersê hat.
- 2-navê xwedanê pirojeya Netewa Demokratîk.

- 3-ap – tersê germ.
- 4-bo nîşana nêzîk-hin tîp ji peyva Hinarok.
- 5-cihê ku "Ka" tê de tê veşartin(b).
- 6-agir-awaz (b).

	1	2	3	4	5	6	7
1	■	■					
2				■			
3			■	■		■	
4							■
5	■						
6							
7			■				

### Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .

8		4	7		1	
1				9	4	
		9	4	1	2	3
	3			2		4
5			4	3		
4	2	3		1		8
	1	7		4		2
4				1	3	
	9	7	6		4	1

### Ferhengok

- شطر Tîş
- شَطْرَيْن Dufîş
- شعوذة Cadûbazî
- شكَايَة Gazindan
- شَفْرَة Gwîzan
- شَوْن Karûbar
- شَوِي Biraştin
- شَهَامَة Ciwamêrî
- شَهْوَة Dilbijandin
- شَوْم Bê oxirî

### PEND Û ŞÎRETÊN KURDÎ

- 1- Her kes mîrê roja xwe ye !
- 2- Kesek nabêje dewê min tirşe !
- 3- Gund avaye, bi du malaye !
- 4- Dem ji zêr e, here pê re !
- 5- Bazdan a hesp e, pesin ji bo siwara !

# WELAT

*derbasî sala xwe ya  
sêyem dibe*



welatpress2014@gmail.com  
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٢٠) ٢٠١٥/٤/٢٠